

flashhilat

fanzîna ji fotografîyê dinizile

HEJMAR: 3, NÎSAN 2019

Mehê carê derdikevim. Kesên dixwazin fotograf û nivîsên wan ên li ser fotografîyê di ser min re belav bin, dikarin wan ji flashhilat@gmail.com re bişînin.

Edîtor: Omer Faruk Baran

Berpirsa Belavkirinê: Leyla Arısoy

flashhilat, HEJMAR: 3

Çapa 1ê: 40 nusxe, Riha - Nîsan 2019

Çapa 2yan: 50 nusxe, Riha - Nîsan 2019

Çapa 3yan: 100 nusxe, Riha - Nîsan 2019

Çapa 4an: 30 nusxe, Dîyarbekir - Îlon 2019

 **flashhilat**  **flashhilat**  **flashhilat.fanzin**

SILAVA EDÎTOR

Dinya vê mehê di bin fotografê Çala Reş de ma. Ajansên navneteweyî û profîlên şexsî dûr û dirêj qala fotografê wê çalê dikin. Em dibên qey fotografê ew çala ku ronîyê jî dadîqultîne, ji fezanasan jî pirtir kêfa wênekaran xweş kir. Çinku Çala Reş, ku bi navê “gurê ronîxwur” jî tê nas kirin, hîn berî wêneyê wê were girtin, ji erbabên karan, bi taybetî bo wênekaran tişteke bi tirs û talûke bû. Mîsal, wênekarekê gava li wênekarekî nifir dikirin dîgo “Tu di tirba sipî kevî, fotografên te di çala reş” Yan ku wênekarekî dixwest di şevtarîyan de xwe bi ronîya pir hindik teselî bike dîgo “Kuro baş e tu li Çala Reş fotografan nagirî, ka li wir teyê çi xwelî li serê xwe bikira?” Em hêvî dikin ku wêneyê pêşî yê Çala Reş nifir û kufr jî têde gelek gotinên wênekeran bi xwe re biguherîne û ilimê siberojê fehm bike ku çi bi serê tiştên dikevin wê tê. flashhilat, bi fikarên hilî bi encamên virnî, bi çêlçalên ji xwe çêbûne, gaveke Nîsanî diavêje.

WÊNEYÊN WENDA YÊN MÎR CELADETÎ

Înanolo

Albûm

Di payîza 2017an da gava li Enstîtuya Kurdî ya Parîsê stajyer bûm, rastî kopîyeka albûma kesekî bi navê J. H. Wilson hatim. Ev albûma ji gelek wêneyên şexsiyetên kurdan pêk hatî bi navê *Historical Figures of Kurdistan* (2006) bû. Tevî ku ne albûmeka taybet û xweser û wêne ji aliyê xwedîyê albûmê ve nehatibûn girtin jî, ev albûm ji ber ku hema hema xwedî wêneyên hemû şexsiyetên kurd yê dîrokî bû, rehetîyekê dida meraqdarên xwe. Di albûmê da hemû wêneyên naskîrî yê ji Qazî Mihemed, Simko, Şêx Mehmûd Berzencî, Şêx Seîd, Seyîd Riza, Malbata Bedirxaniyan heta şexsiyetên dîroka me ya nêzîk jî hebûn. Lê wêneyek hebû ku heta wê rojê min qet nedîtibû û gelekî lê şaş mabûm.

Ziman

Ev wêneyê ku behs dikim portreyekî Celadet Alî Bedirxanî bû. Li bin portreyê hatibû nivîsandin:

Prince Celadet Bedir Khan, 1923 (© Baran).

Dîroknasên me dê baştir bizanin: Celadet di wê salê da li Elmanyayê bû loma bi dilekî rehet dikarim bibêjim ev wêne li Elmanyayê hatîye girtin. Herçî Baran bû, tevû hemû pirs û lêpîrsînên xwe jî min tu agahîyek li ser wî peyda nekir, heta çendek berê.

Mîr Celadetî di vî wêneyê xwe da şewqeyeka her wekî ya Charlie Chaplinî dabû serê xwe û simbêlê wî jî her dima yê wî. Destê wî li ser hev li ser gopalekî, çeneya wî jî li ser destan. Mîrê me yê ku di zimanê me yê bav û kalan da bûbû pêşengê şoreşa mezin, di portreyê xwe da jî ev tesdîq dikir: zimanê xwe mîtroyek dirêj kiribû û ji me ra dibişirî. Piştra gelek caran min dê bi hesteka neteweperestane ji xwe ra bigota ku qeşmerê Einsteinî jî teqlîda mîrê me kir di wî wêneyê xwe yê meşhûr da, ew wêneyê ku zimanê wî nedigihîşt çaryekê zimanê mîrê me, îcar ma aqil.

Ev wêne pir kêr dihat zanîn û yê hay jê hebûn jî nedixwastin li ser biaxivin. Hemû dîroknasên ku bi wan ra diaxivîm mirûzê xwe tirş dikirin gava behs dihat ser vî wêneyî. Wêne li ser înternetê jî nehatibû barkirin û ev, gumanek bi min ra çêdikir ku kurd ji ber vî wêneyê Celadetî fedî dikin û heger ji dest wan bihê dê vî wêneyî pirtî pirtî bikin, pirteka wê jî li dinyayê nehêlin. Ji ber vê tirsê min hildabû telefona xwe, wêne scan kiribû. (Bnr Wêne 1)

Rojnivîsk

Celadet Alî Bedirxan di rojnivîska xwe da behsa hevaleyê xwe yê wênegir yê bi navê Mirad dike. Mirad hevalê wî yê zarokatîyê bûye li Stenbolê. Li gor ku behs dike, malbata wan ji kurdên ewil yê Stenbolê ne, zêde tiştek ji kurdbûna wan nemaye û Mirad jî tenê bi çend peyvên kurdîyê dizane. Mirad li Elmanyayê gelek caran bi Celadetî ra derdikeve gerê bi bisqilêtê û wêneyên wî digire. Celadet di 1ê tebaxa 1923yan da weha behsa roja xwe û Miradî dike (eyb e meriv bêje, min ji tirkîyê wergerand):

“Îro jî ez bi Miradî ra derketim gerê. Axir baranê wekî duhê li me nekir. Kêfxweş dibim ku hevalekî min yê bisqilêtê li vir heye. Ev yek kê m be jî têhna min ya xerîbîyê dişikîne. Miradî wêneyê keçikekê nîşan da. Aşiq bûye. Ez bim ez dê jî aşiqî vê keçikê bibim. Melayket. Dibêje, sibehê kincên xwe yên xweşik li xwe bike ez dê wêneyekî te yê miezem bigirim. Kincên min her tim yên xweşik in. Ev bûn çend wêneyên min ez jî nizamim, lê bi rastî jî ez heyran û heşmetkarê wêneyên wî me.

“Dolar zêde dibe. Mala wî ava be, Miradî pakêtek cixare da min. Fedî dikim jê ra bibêjim ez bê pere me. Ax şûşeyek araq jî hebûya. Sebira min nema.”

Ew Baran ev Mirad e gelo?

Kitêb

Her wekî ku edîtorê min jî dibêje, “portre ne tenê nasnameya rûyê mirovî her weha nasnameya dilê mirovî ye jî.” Ev pênase hemû gavan dihat bîra

min gava min li portreyê berbehs yê Celadetî dinihêrî. Celadetî dilê xwe li ber min raxistibû û ez dawetî şikefta xwe ya rengorengo dikirim.

Di maweya van du salan da her bi hêvî bûm ku ez dê li derinan rastî wêneyên wenda yên Celadetî bihê. Dostê min yê helbestvan H. Henûn ku hay ji vê lêgerîna min hebû, berî du hefteyan (dawîya adarê) haya min jê çêkir ku hevalê wî yê lêkolîner, Cimşît Heftperçe, kitêbekê li ser wênegirekî kurd yê jibîrbûyî amade dike ku hin wêneyên Celadetî jî tê da hene. Li ser vê xeberê bi rêya e-mailê min pêwendî bi birêz Heftperçeyî ra danî û Xweda xêra wî qebûl bike, kitêba xwe berî çapkirinê ji min ra şand.

Erê, ew wênegirê li pey şopa wî ketibûm ev bû. Cimşît Heftperçe di pêşgotina kitêba xwe ya çapnebûyî ya bi navê *Mirad Baran: Li Pey Şopa Wênegirekî Kurd yê Jibîrbûyî* da behs dike ku gava ew ji bo xwendina lîsansa xwe ya bilind çûye Elmanyayê, xwendin û xebata xwe derheqê wêneyên kurdan da kirîye. Di lêgerîneka weha da

rojekê rastî jineka elman hatiye û ev jin jê ra behsa albûma bapîrê mêrê xwe yê rehmetî kirîye. Li gor jînikê di albûmê da gelek wêneyên li ser kurdan jî hebûne. Ev albûm, albûma wêneyên Mirad Baranî ye.

Di kitêba Cimşît Heftperçeyî da em rastî 343 wêneyên cuda yên Baranî dihên ku piraniya wan portre ne. Di albûmê da tevî portreyê berbehs yê Celadetî heft wêneyên Celadetî yên din jî hene ku heta niha haya kurdan jê tune bû û nedîtibûn. Alîyê herî baş yê vê albûmê ji bo Heftperçeyî ew bûye ku li dawîya her wêneyî çîroka wêneyî jî hatiye nivîsandin. Tevî ku Heftperçeyî nehişt ez çîroka wêneyan neqil bikim jî, ez gelekî spasdarê wî me ji ber ku destûr da ez du wêneyên Celadetî yên albûmê bi kar biînim.

Belkî aqûbeta wênegirê me yê jibîrbûyî hatibe meraqkirin, ez bibêjim: Mirad Baran di dema herba dinyayê ya duyem da dimire.

Wêne

Di wêneyê ewil da Celadetî bi dîreksiyona bisqilêta xwe girtîye û poz daye. Şalekî reş, îşligekî spî û êlegek lê ye. Simbêlê wî tune ye li vir. Meriv fam nake gelo di vir da dibişire yan na. Tu bertekek li ser rûyê wî xuya nake. Meriv kêfxweş dibe ku mîrekî me yê pisporê zimanî her weha pisporê bisqilêtan be jî. Ev asta wî ya entelektuelîyê jî zêde dike, heyranîya me jî. Heçku ev jinika li pişt wî jî heyraneka wî ye. Rojname di dest wê da vekirî, pala xwe daye bûfeyê û di bin çavan ra li mîrê me dinihêre. Binihêre. Çima nenihêrî? (Bnr Wêne 2)

Di wêneyê din da Celadet û xanimek li bin şemsîyeyê ne. Şemsîyeya wan bi xêzan dagirtî ye ji jorê ber bi jêrê. Vê carê çakêtek li mîrê me, cixareyek di devê wî da ye û şemsîyeyê digire. Jinik cixareyê nakişîne, devê wê li ken e û bi heyranî li mîrê me dinihêre. Ez vê bi jinika Wêne 2 ra didim ber hev. Dişibin hev. Gelo dibe ku ev jinika Wêne 2 çav berdabe mîrê me, çûbe cem wî û bûbe dosta wî? Ez nabêjim weha ye. Tenê îhtimalek. Porê

jinikê xelekî ye û dadikeve heta berstûka mantoyê wê. Meraq dikim: gelo mîrê me tam di wê kêlîyê da li çî difikire? Belkî jî nafikire. (Bnr Wêne 3)


Payîn

Zêdetir nikarim tişteki li ser wêneyan bibêjim, destûra min tune ye. Tenê dibêjim bi hemû meraqa xwe li derketina kitêba Cimşît Heftperçeyî bipên. Tevî wêne û çîrokên wêneyên Celadetî, nameyeka Celadetî ya ji bo Miradî jî heye di kitêbê da. Nameyeka ku dê hemû zanîna me ya li ser jîyana taybet ya Mîr Celadetî biguherîne.

Têbînîya Edîtor: Jiber ku cih di fanzînê de nema, me hevokên nivîskêr yên bi endîşeyeke edebî nivîsandî û pêveka wî ya wêneyan derxistin. Li qisûrê menêrin.

Nîsan 2019, Bismil

KEVNEFOTO



Sir John Herschel
Margaret Cameron, 1867

BÊQUSIRIYA FÎDANEKE SÎMETRÎK
HÎDAYET XANIM
Rohat Alakom



Ev wêneyê Hîdayet Xanimê qasî 25 salan heye ku di arşîva min de wek wêneyekî berdilk û dûrîdest tê parastin. Keça wê Hale Xanimê ev wêne berî salan li Swêdê dîyarî min kiribû. Di wan salan de min li ser mijara Hêzeke Nû li Kurdistanê: Jinên Kurd kar dikir.

Dema ez bona serdaneke çûme bajarê Västeråsê ku Hale Xanim lê dima, wê xanima xaniman bi dûr û dirêj qala malbata xwe, zewaca xwe û kurdên ku di demên berê de li Stembolê diman, kir. Tevî salên xwe yên bihurî gelekî hurmeta min girt. Kubarî, giranî û mêvanhezî di xwîna wê de hebû. Dema me wêneyên ku di albûma wê ya malbatê de hebûn mêze dikirin tavilê vî wêneyê ku niha bergê pirtûka min xemilandiye (Komeleya Pêşketina Jinên Kurd, Avesta, 2019) bala min gelek kişand. Li paş wêne ev gotinên tirkî dihatin xwendin ku ji aliyê Hale Xanimê de hatibûn nivisîn: "Sala 1940 Başkale, gundê Tavîh dayîka min Hîdayet" (1940 Başkale, Tavîh köyü, annem Hidayet). Van çend gotinan bêgûman qiymetê vî wêneyê zêdetir dikir.

Gelek wêneyên mêrên vê malbata navdar li ber destên me hene. Lê belê cara pêşîn min dît ku jineke ji malbata Bedirxaniyan bi cil û bergên neteweyî poz daye. Çawa tê zanîn di gelek wêneyan de her jina kurd poz nade, tenê wêneyê wê tê kişandin! Lê belê Hîdayet Xanim di vî

wêneyê muhteşem de çavên xwe kutaya kamerayê. Wek tabloyekê, peykerekê sekiniye. Esalet, torinî û kubariya wê di wêne de gelek vekirî derdikeve pêş. Xalîçeyê ku di bin lingên wê hatiye raxistin û cilên wê ku li erdê re dikişin hev temam dikin. Ew fîgura xalîçe ya ku wê lingên xwe daniye ser û jêraya fîstanê wê qasî hev in û gelek bi hev hatine. Wêne di dawiyê de dibe berhemeke hunerî. Ew reşaya paş wê ku fonekê pêk tîne Hîdayet Xanimê gelek vekirî derdixe pêş, ev xanima kurd di wêne de wek rojekê hiltê! Bejna wê ya dîk û zirav mîna fîdanekê gelek sîmetrîk xuya dike. Hemû ev bêqusirî, vî weneşê kevn jî bêqusir dikin!

Hîdayet Xanima ku tam berî 50 salan (1969) çûye dilovaniya xwe îro çawa em dibînin di nav heyran û dildarên fotoyan de dijî, bergên pirtûkan dixemilîne û bûye mijara nivîsên fanzînan.

'EYNEYA JÎYANÊ

Berken Bereh

12 îlona sala 1980 darbeya leşkerî pêk hat. Îlona 1981an dema ji karê xwe yê mamostetîyê hatim dûrxistin maweyek dirêj wek masîyê ji avê hatî derxistin min xwe di nav psîkolojîyek xerab de hîs kir. Min nezanî çî bikim. Piştî salekê min dest bi karê fotografê kir.

Min Canonek ku hecîyek ji hecê bi xwe re anî bû jê kirî û min berê xwe da xweza û nav kolanê hema çî hate ber çavê min min dikêşa.

Paşê ez bûm aboneyê kovara fotografê ya ÎFSADê (niha ÎFSAK). Min bi saya vê kovar û çend kitêbên li ser karê hunera fotografê xwend ez pê hesîyam ku hunera fotografkêşîyê ked û zanîn û behremendîyê dixwaze. Bo vê jî min bêtirî keda xwe da ser zanîn û bi kar anîna mekîna analogê. Ka diyafram iso, enstantane, mercek, ronahî û dizayna dîmenê divê bi çî awayî be.



Foto: Berken Bereh

Soberî, Gundê Bereşa ya Dihê - Tebax 1988

Li vir dixwazim bîranînek xwe vebêjim; Di nîsana 1985 de nîvroyekê ji nişkav bû gurgura ewran û beledî vedan, çend deqîqe di ser re derbas nebûn me hew dî bi dehan leşker ketin nava qehwê.

Serbaz bi dengê bilind “ev teqîn çi bû, kê gulle berdan” yên li qehwê gotin “qomutan gurgura ewran e û beledî vedan” lê serbaz qanih nebû em giş derxistin derve û berê me da bexçê qereqolê û me dît ku li dikan û sikakê kî dîtine anîne wir û em jî li kundil man li ber baranê. Serbaz hey qîrqîra wî

ye, “Divê ê ku gulle berdan hûn aşkere bikin an dê li ber vê baranê bin.” Hingê min dî koçerek bi pistepist ji ên kêleka xwe re got “Xwezî niha qeztecîyekli vir heba û fotografê me bikêşa.” Bi vê gotina wî beledî di hişê min veda û min ji xwe re go dibînî ev camêr jî zane ka hêz û şîyana fotografê bê çiqasî xurt e. Ji wê rojê pê de bêtir li ser fotograf û hunera wê xebitim û min got “Divê ez di kîjan warî de xwe perwerde bikim; portre, belge, dîrokî hwd.”

Pişt re ji xweşbextê min re doktorek Bodrumî ku dildarek karê fotografê bû hate bajêr û min û wî dest bi kar kir. Min gellek sûd jê wergirt û xwe perwerde kir. Doktor Hakanî dawîya sala 1984an li Bodrumê sergîyek ya fotografan amade kir û 8 fotoyên min jî li wê sergîyê hat raxistin. Mixabin ewî doktorê hew fotografên min dane min û tayîna wî derket û çû.



**Foto: Berken Bereh
Yarmetî, Şavşat, Gulan 1988**

Min bêhtirî fotografên belgeyi û ên dîrokî dikişand. Di sala 1985an de Şaredariya Dihê ji min xwest ku ez fotoyên cih û mekanên dîrokî bo salnameya wan bikêşim. Min ew kêşan û perê hingê pereyekî pir baş dane min. Lê ji ber giraniya filman û pereyê tabkirina wan min dev ji wî karî berda û bo kareke bi îstîkrar ez koçî Şirnexê bûm.

Di sala 2012de min vê carê dest bi karê şiroveya fotografan kir. nivîsek min a şiroveya fotografekê di salnameya Şaredariya Surê de hate weşandin.

Ta niha jî car caran fotografan dikêşim. Îro giham wê bawerîyê ku fotograf û fotografkêşî wek hemû huneran helwest û sekneke li hember stemkarî, bişaftin, bêeslkirina insanî, ... mirinê.

Fotografkêş bi her fotoyek xwe berê me dide jîyaneke aram, biesl û vîn û şiyana me ya hez kirina ji xwe, civat û xwezayê xurttir dike.

SALÛSÎNORÊN DIL

Jan Dost

Jê hez dikim.

Jê ditirsim.


Newêrim nêzîktir bibim.

Di navbera min û wê de bîst sal û bi hezaran manî.



Jan Dost, ku li Kobanîyê mezin bûye, wê derê piştî 20 salan ji sînorê Tirkîyê dibîne.

Sirûc - Nîsan 2019



Wêneyê Çala Reş bi hevkarîya heşt teleskopian cara pêşî hat girtin. Çala Reş ji cîhanê sê mîlyon qat hîn mezintir e û ji wê 500 mîlyon trîlyon kîlometre dûr e.

Foto: EHT Collaboration